

Pirsîyar û Bersiv




Çawa mirov dê şêt hêkên kevin û nû jêk cuda ket?

Hêk xwarineka berbelav û xweş û bimifa ye. Lê eger kevin bibît wek hemî xwarineka dî dişêt zîyanê bigehînîte tendrustîya mirovî. Ji ber hindê divîya mirov yê hişyar bît dema hêkan dikirît. Li welatên pêşkeftî li ser pakîten hêka dihête nivîsîn ka heta kîj rojê bi kêr xwarinê dihêن. Lê li dev me mixabin ew tişt nîne. Hêk jî ne wek fêqî û keskatî ye ku mirov ji xulkê wê bizanît ka ya kevine yan ya nûye. Pa mirov çawa dê zanît ev hêke ya kevine yan ya nû ye? Pisporêñ vî warî dibêjin dû rêk hene:

1-Hêka kevin ji ya nû siviktir e eger mirov li ber guhê xwe bihejînît şilqênek ji hêka kevin dihêt. Lê ew deng ji ya nû nahêt.


2-10% ji amanekî tijî xwê bike. Paşî tijî av bike û bila ew xwê di wê avê da bihelîyêt. Paşî hêka berde têda. Hêkên nû dê bin av bin lê yên kevn dê bi ser avê kevin.



Çawa rûwek şîn dibin?

Ji bo kû ruwek şîn bibît pêwîstî bi sê tiştan heye hetav, av û ba. Belgên rûwekê hetavê dimêjin û bayê heldikêşin. Rehêن wê jî av û mîniralan ji axê dimêjin. Şaneyêñ belgên rûwekê bi harîkarîya hetavê ji avê û dîoksîdê (dû wemîn oksîda karbonê) corekê şekirê çê diken ku ruwek pê dijît û werarê diket. Di vê kirîyarê da rûwek oksîcînê ji xwe berdidet ku gazeka pêwîste bo hemî zîndeweran.





Dara Kirismisê ji kîrê hatîye?

Hemî malên ewrupî li heyva diwazde dareka kajê (siroştî yan çêkirî) dixemlinin û di dane di malên xwe da. Ev dare bi "Dara Kirismisê" yan dara cejna ji dayîkbûnê dihête bi nav kirin. Ev rîweresme jî gelek ji dayikbûna 'Îsa pêxemberî kevintire û bo cara êkê li Elmanîya hatîye gêran. Hîngê dara kajê ji ber ku hemî salê ya keske, nîşana nemiriyê û xêr û bereketê bû û bi çavekê pîroz lê dihate nêrîn. Piştî hîngê hêdî hêdî ev rîweresme li hemî cîhana kiristîyanî belav bû û dar bo nîşaneka ji dayîkbûna 'Îsa pêxemberî. Evro ne tenê kiristîyan (fele) belkû piranîya cîhanê vê darê bi helkeftên Kirîsmisê û sersalê li malên xwe dadinin û ev dare ji bilî ku dîmenekê ciwan dibexşîte malan zarok xweşîyeka gelek mezin jê dibînin.



**Bo çî befr ya
sîpî ye?**



Befr aveka bestgirtî ye. Em dizanîn ku av ya bê renge. Pa bo çî dema dibîte befr sîpî dibît. Her patoreyeka befrê ji gelek kirîstalên cemedê pêk dihêt. Her kirîstaleka cemedê jî gelek rûvî hene. Û ew rûvî ronahîyê berûvajî diken û ji wê berûvajî kirinê rengê sîpî xwîya diket. Tiştê seyr ewe ku hemî kirîstalên cemedê di şeskûjî ne lê hîç kirîstalek wekî ya dî nîne.

